

Di
10
Pirsan Da
Hepatî B

*Koli: Li Tirkiyeyê di jargona LGBTI+'an de tê wateya təkiliya zayendi.

Komeleya HEVÎ LGBTÎ+
Rêzenivîsa Kolîme Saġlık a 5î

Di 10 Pirsan Da Hepatît B

Sibat, 2024

Amadekar
Filiz Ak
Ameda Karakuzu
Ercan Aydın

Tertibker û Sewirîner
Zafer Rîfat Irmak



“Ev broşûr ji aliyê Wezaretê Karên Derve ya Fransayê ve bi navberitiya Balyozxaneyê Fransayê ya li Enqereyê hatiye amadekirin. Berpirsariya naverokê bi tevahî aîdê Komeleya HEVÎ LGBTÎ+ ye û nêrinên Balyozxaneyê Fransayê nade der.”

Di 10

Pirsan Da Hepatît B

Hepatît çi ye?

- 1.Hepatît B çi ye?
- 2.Hepatît B çawa tê veguhêztin?
- 3.Hepatît B çawa nayê veguhêztin?
- 4.Kî di bin xetereyê da ye?
- 5.Pêkan e ku pêşî li veguhêztina Hepatît Byê were girtin?
- 6.Nişaneyên Hepatît Byê çi ne?
- 7.Ez ê çawa zanibim ku di min da Hepatît B heye ango tune ye?
- 8.Di navbera Hepatît Byê û enfeksiyonên din da têkili hene?
- 9.Tedawiya Hepatît Byê heye?
- 10.Heke di derbarê Hepatît Byê da li ser hişê min “Pirsên ecêp” hebin, ez dikarim çi bikim?

Hepatît çi ye?

Hepatît, têgeheke îltihabbûna kezeba reş e. Gelek sedemên wê hene. Her çi qas vexwerina zêde ya alkoholê, hin derman, toksîn, hin rewşên tibbî bibin sedemên hepatîtê jî sedema sereke vîrus bi xwe ne.

Pênc cureyên vîrusê hene ku jê ra vîrusên hepatît tê gotin. Hepatîta A, B, C, D, E. Ji wan Hepatît A (HAV), Hepatît B (HBV) û Hepatît C (HCV) bi piranî berpirsyarên hemî hepatîtan in. Nîşaneyên van her sê vîrusan dişibin hev, lê pêgirtin û bandora wan a li ser kezeba reş cuda ye. Ji bo HAV û HBVyê derzî hene lê ji bo HCVyê derziyek bi bandor tune ye.

01

Hepatît B çi ye?

Enfeksiyona Hepatît Byê, nexweşiyêke kezeba reş e ku sedema wê vîrusa Hepatît Byê ye.

Di veguhêztina Hepatît Byê da dibe ku nexweşiyêke sivik biqewime û nîşaneyên wê pir hendik bin an jî qet tune bin. Di hin kesan da enfeksiyonek domdar an jî dikare heta heyî jî bidome.

Di dinyayê da bi milyonan însan, jiyana xwe bi Hepatît Byê û bi Hepatîta Kronîk ra dijîn hene ku haya wan jê tune ye. Sedema sereke ya penceşêra kezeba reş jî ji Hepatît Byê ye. Û tê zanîn ku neqilkirina kezeba reş jî ji ber vê sedema mezin e.

Hepatît B çawa tê veguhêztin?

Ew dema ku şilavên laş ên mîna avik an xwînê, ji kesê/a ku bi vîrusa Hepatît Byê vegirtî bikeve kesê/a din tê belavkirin. Hepatît B ji HIVê 50-100 qat zêdetir û zûtir tê veguhêztinê. Veguhêztina wê, bi têkiliya cinsî ra hêsanî çêdibe. Hepatît B, ji bilî vê bi parvekirinên derzî, enjektor û alavên din ên derzîlêdana bêhişkeriyê jî tî veguhêztin.

Vîrusa Hepatît Byê dibe ku mîna bi awayên jêrîn werin veguhêztin:

Jineke ducan ê enfektebûyî ra derbasê pitika wê dibe Têkiliya cinsî ya kesên bi HBVê ra dijîn û nikarin xwe bigîhînin tedawiyê

Derzî û enjektorên bi xwîna kesên Hepatît Byê ra temaskirî û heta bi parvekirinên alavên tibbî yên mîna monîtorên glikozê

Temasa rasterast a bi xwînê an birînên vekirî yên kesên bi Hepatît Byê ra dijî

Di tesîsên tenduristiyê da bi kêmbûna kontrola enfeksiyonê veguhêztin çêdibe

Her çi qas kêm be jî, dibe ku bi bikaranîna hevpar a mîna firçeya diranan an jî bi makîneya traşan jî veguhêztin pêk werê.

Bi rêya cinsî ve veguhêztin û Hepatît B

Hepatît B, dikare bi rêya cinsî ra were veguhêztin. Mirovên nederzîkirî yê ku xwediyê gelek hevalbendên seksê û bi enfeksiyona Hepatît B ya kronîk in, zêdetir di bin xetereya veguhêztinê da ne.

Di nava kesên bi enfeksiyonên rêya cinsî ve enfekte bûne da, bi rêjeya %10 û %40 da delîlên enfeksiyona Hepatît B ya berê an a heyî hene. Piraniya van enfeksiyonan, di dema pêşkêşkirina karûbarên pêşilêgirtinê an jî dermankirina enfeksiyona cinsî da dikaribû bi rêya derziya gerdunî were astengkirin. Ji ber ku pêkerên xetereya behremendî ji bo enfeksiyonên bi rêya cinsî û Hepatît Byê dişibin hev, xizmetên pêşilêgirtina Hepatît Byê hemî kesan ra wekî beşek ji karûbarên pêşilêgirtinê yê rûtîn di nav dezgehên dermankirina enfeksiyona bi rêya cinsî da enfeksiyona Hepatît Byê di nav kesan da kêmîtir dike.

03

Hepatît B çawa nayê veguhêztin?

Her çi qas di tifê da Hepatît B hebe jî, bi rêya hevramûsîn û ramûsan nayê veguhêztin. Bi temasên rojane yê wekî destdanhev, hembezkirin, bi heman xwarina tebeqê, bi rêya av û xwarinê, bênijîn, kuxik û bi mijandinê ve nayê veguhêztin.

04

Kî di bin xetereyê da ye?

Kesên ku derziya Hepatît Byê nebûne, kesên ku derzî bûne lê di asta antîkora wan li hemberê HBVyê ne zêde ne bê parastin in. HBV, ji her kesên ku bêparastin in ra bi xwînê an jî bi têkîliya cinsî tê veguhêztin.

Parvekirinên derzî an jî alavên din ên ku ji bo derzîlêdana bêhişker tîk bikanînin, mirovan dixe bin xetereya Hepatît B, C û HIVê. Ji kesên ku bi HIVê enfekte bûne lê nehatine teşxîskirin û tedawîkirin da %10 Hepatît B û %25an da jî Hepatît C heye.

Ji bo ku kesên LGBTI+ û karkerên sexê ra gîhandina kondoman bi sînokirî ne, ji ber parastina wan a ji HBVyê, girîng e ku bînin derzîkirin.

05

Pêkan e ku pêşî li veguhêztina Hepatît Byê were girtin?

Ji bo pêşîlêgirtina veguhêztina Hepatît Byê temas û derzîkirin girîng e. Li dijî Hepatît Byê derziyek parastinê heye. Derzîkirina li dijî HBVyê ji bilî kêmkirina enfeksiyonê, di heman demê da ji bo pêşîlêgirtina penceşêra kezeba reş rêbazek bi bandor e. Wekî ku tê zanîn, derziya HBVyê ya yekemîn derziya penceşêrê ye.

Derziya Hepatît Byê, di sala 1998an de li Tirkîyê di salnameya derzîlêdanê ya zarokatîyê da bi cîh girtiye. Derziya Hepatît Byê di sê dozan da tê kirin ku yekem car zayînê da, di dawîya meha 1ê û di dawîya meha 6an da.

Bi Bernameya Pêşîlêgirtin û Kontrolkirina Vîrusa Hepatîtê ya ku li Tirkîyê tê meşandin, armanc dike ku pêşî li enfeksiyona Hepatît B ya kronîk bigire û belavbûna nexweşîya kezeba reş a kronîk a bi Hepatît B, Sîroz û Penceşêra Hepatosellûler kêmbike. Hatiye dîtin ku li Tirkîyê di navbera salên 2015an-2019an da li gor salên 2005-2009an, ji sedî 76 hejmarên nexweşên Hepatît Byê kêmbûne.

Heke hûn beriya sala 1998an ji dayik bûne û derzîlêdana we ya Hepatît Byê tune be, an jî hele hûn piştî 1998an jî dayik bûne û pirsên we yên li ser dêrzîlêdanan hebin, hûn dikarin bi bijîşkek bişêwirin û test bidin çêkirin û heke hûn ne bi parastin bin, hûn dikarin bi rêberiya bijîşk ve xwe bidin testkirin.

06

Nîşaneyên Hepatît Byê çi ne?

Enfeksiyona Hepatît Byê dikare kurt (akût) an jî dirêj (kronîk) bidome

Hepatît B ya akût ew tişt e ku di nav şeş mehên ewil da, piştî ku mirov bi vîrusa Hepatît Byê dikeve derdikeve

holê. Bi hin kesên ku Hepatît B ya akûtê ketine da, nişane an nayê xuyakirin an jî kêr didomin. Enfeksiyona Hepatît B ya akûtê, dibe ku mîna nişaneyên grîbê; wekî westiyayîbûn, bêhalî, bêîştahî, xelîn, vereşîn û sincirîna sivik da xwe bide der. Ji ber zêdebûna bilîrûbîna li xwînê, dibe ku li ser çerm û derdora spî ya çavan ku jê ra sklera tê gotin, zerik û rengên qehweyî ên zelal werin ditîn.

Di dema enfeksiyona akûtê da, antîjena ruxar a HBVê (HBsAG) û antîjena HBVê (HBVeAg) di nav çar hefteyan da, piştî enfeksiyonê dikare were tespîtîkirin. Pênegirtin û çareserîya enfeksiyona li dû pêşkeftina HBsAgê û antîkorên li dijî HBeAgyê (antî-HBs Ab û antî-HBe Ab) pêş dikeve. Tespîtîkirina antîkorên Anti-HBsye pênegirtinê nişan dide.

Kêmbûna antîkorên li dijî HBsAgyê, enfeksiyona HBVyê ya kronîk nişan dide. Pîraniya kesên ku bi Hepatît Byê ketine, heta destpêkirina Sîrozê an jî nexweşîya kezeba reş a qonaxa dawî bê nişan dimînin.

Ez ê çawa zanibim ku di min da Hepatît B heye ango tune ye?

Gelek kesên ku bi Hepatît Byê ketî da, nîşane nayên xuyakirin. Ji ber vê yekê yekane rêya zanîbûna Hepatît Byê testçêkirin e. Ji her 3 kesên ku bi Hepatît Byê ketî da, ji wan 2 kes nizanin ku bi enfeksiyonê ketine. Bijîşkên ku hepatîtê tespît bikin, li gor cureyên hepatîtan yek an jî ji yekan zêdetir testên bi xwînê çê dikin.

Divê kî were testkirin?

Ên ku temenê wê/wî li ser 18 saliyên in, jiyana xwe da herî kêr careke

Hemî jinên ducan, di qonaxên despêkê yê her ducaniyê da Pitikên ku ji jinên ducan ên bi HBVê ra dijîn tên dinyayê

Her kesên ku testa Hepatît Byê daxwaz bikin

Her kesên ku di bin xetereyeke mezin a Hepatît Byê da bin, divê bi awayekî periyodîk werin testkirin

Heke enjektorên yekcare, ji hêla kesên din ve ji careke zêdetir bên bikaranîn, divê ew bi awayekî periyodîk werin testkirin

Kesên ku bi HIVê ketine lê nikarin xwe bigihînin tedawîkirinê

Kesên ku bi Hepatît Cyê dijîn

Kesên ku xwediyê gelek hevalbendên seksê ne

Kesên ku diyalîza gurçikan dibînin

Kesên ku xwediyê enzîmên kezêba reş ên mezin in û sedema wan nizanin.

Kesên ku xwîn, plazma, organ, tevînek û avika xwe dibexşînin

08

Di navbera Hepatît Byê û enfeksiyonên din da têkilî hene?

Rêyên veguhêztina Hepatît Byê, di heman demê da rêyên talûkeya veguhêztina Hepatît C û HIVê ye jî. Parvekirina derzî an materyalên din ên ku ji bo derzîlêdana bêhişker an dermanan tên bikaranîn, mirov dixin di bin xetereya Hepatît B, Hepatît C û HIVê. Her çi qas CYAE, gelemperî bi têkiliya cinsî ve bên veguhêztin jî, ew dikarin bi rêya hin xwîn û hilberên xwînê ve jî bên veguhêztin. Dema ku di kesek da CYAE hebe, girîng e ku testkirinên din jî bên çêkirin, lewra dibe ku di ew kesan da yekan zêdetir CYAE hebin. Dema ku hûn ji bo hepatîtê tên testkirin, hûn dikarin daxwaza testkirina gelemperî bikin.

09

Tedawiya Hepatît Byê heye?

Kesên ku ji bo testa wan a Hepatît B ya ku akûtê pozîtîf derketiye, bi lênîherîna piştgirî (bêhnvedan, xwarina têr û vexwarin) têne tedawîkirin. Dermaneke bi taybetî tune ye.

Kesên ku bi Hepatît B ya kronîk ra dijîn dikarin dermanên antîvîral ve bên tedawîkirin û divê bi rêkûpêk ji bo nîşaneyên pêşketina nexweşiya kezeba reş bên şopandin.

Ji bo kesên ku bi Hepatît B ya kronîk dijîn ra tedawiyên cûrbecûr hene ku dikarin tenduristiya wan baştir bikin û bandorên wê li ser kezeba reş dereng bixin an jî berevajî bikin.

10

Heke di derbarê Hepatît Byê da li ser hişê min “Pirsên ecêp” hebin, ez dikarim çi bikim?

Hûn dikarin bi bijîşkê xwe yê malbatê û/an nexweşiyên enfeksiyonî û pisporê mîkrobiyolojiya klînîkî bişêwirin. Heke hûn di derbarê serlêdana xwe da dudil bin, hûn dikarin bi komeleyên LGBTÎ+an bişêwirin da ku xwe bigihînin bijîşkên dostên LGBTÎ+an.

Çavkanî:

CDC. Hepatitis B. (2023). <https://www.cdc.gov/hepatitis/hbv/index.htm>

Schneider, J. S., Silenzio, V. M., & Erickson-Schroth, L. (Eds.). (2019). *The GLMA Handbook on LGBT Health* [2 volumes]

“Ev broşûr ji aliyê Wezareta Karên Derve ya Fransayê ve bi navberîtiya Balyozxaneyê Fransayê ya li Enqereyê hatiye amadekirin. Berpirsyariya naverokê bi tevahî aidê Komeleya HEVÎ LGBTÎ+ ye û nêrînên Balyozxaneyê Fransayê nade der.”

Naveroka vê broşûrê ji aliyê Pispora Hekîmîtiya Malbatê Bijîşk Filîz Ak, Pisporekî Karên Civakî Ercan Aydın û Ameda Karakuzu ve hatiye amadekirin.



Me bişopînin!



www.hevilgbti.org



info@hevilgbti.org



+90 216 759 51 95



@Hevilgbt



@Hevilgbt



Hevilgbtidernek

INSTITUT
FRANÇAIS

Turquie

“Ev broşûr ji aliyê Wezaretê Karên Derve ya Fransayê ve bi navberîtiya Balyozxaneyê Fransayê ya li Enqereyê hatiye amadekirin. Berpirsyariya naverokê bi tevahî aidê Komeleya HEVÎ LGBTÎ+ ye û nêrinên Balyozxaneyê Fransayê nade der.”